

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

bîrnebûn

hejmar 51 | payîz | 2011



Şirîka min, Rehme
Xelata Nobelê 2011

Bîranîna Faik Candan
Serokwezîra Danîmark a nû jinek e



Xelata
Nobel  2011

Xelata Nobel  ya  sal b  para  a r  
niv skarek  sw di: **Tomas Transtr mer**.



Serokvez ra
Dan mark a
n  jinek e

Helle Thorning Schmidt



Yıldız Akdoğan



 zlem  ekic 



Bilal  neki



Serdar Beutli



Kurdî kurmancî, pirtûka
xwendin û hîndariyê 2

Bîranîna
Faik Candan

Dayê ji bir meke
Navê mirinê sar e...

'Mağdur ve mağrur
toplumbilimcisi'
Dr. İsmail Beşikçi

Şirîka min,
Rehme



bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carekê derdikeve / Üç ayda bir çikar.

Utges av Apec-Förlag AB
Hejmar 51, payîz 2011
Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi
Edîtor: Ali Çiftçi, Seyfî Doğan, Muzaffer Özgür
Koma redaksiyonê:
A. Çiftçi, Dr. Mikailî, H. Erdoğan, M. Bayrak, î. Türkmen,
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran,
Mem Xelîkan, Mustafa Mih û Yusuf Polat

Adress: Navnîşana li Swêdê
Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post: info@birnebun.com
Internet: www.birnebun.com

Têkili/İlişki
Danimarka: İrfan Baysal, 0045-27 11 58 83
Avusturya: Cüneyt Dağdalan, 0043-69 91 11 55 294
Amerika: Mam Recall, mamoste.kart@yahoo.com

Belavkirin / Dağıtım:
Ewropa: Muzaffer Özgür/Bîrnebûn
Postfach 900348, 51113 Köln / Almanyaya
Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye/Ankara:
Dipnot Kitebevi, Selanik Caddesi No: 82/32
KIZILAY / ANKARA
Tfn: 0312-419 29 32

Anatolia Muzik Center
Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 A
Polatlı-Ankara
Tfn: 0090-312-622 94 36

İstanbul: Selahattin Bulut/Medya Kitapevi
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı: Europa: 5 Euro • Türkiye: 2,5 YTL

Abone
Swêd: 400 SEK • Almanyaya 40 Euro
Welatên din ên Ewropayê: 50Euro

İşveç hesap numarası: (Bîrnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İşveç dışındaki aboneler için
APEC, "Bîrnebûn" Plusgirot-Stockholm/Sweden
BIC: NDEASESS
IBAN: SE85 9500 0099 6026 4686 5127

Çap / Baskı: Apec-Tryck AB



"Şaristanî-II", 40 x40x2 cm, bi teknîka tevlihev, li ser caw

Wêneya li bergê: "Şaristanî-I", 40 x40x2 cm, bi teknîka
tevelihev, li ser caw

Hunermend: Hasan Hüseyin Devci.

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tîn, serrast û
kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegevandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û
Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

Naverok/İçindekiler

6	Ji Bîrnebûnê Ali Çiftçi	28	Rojek ji rojyê, terawî û Okey Ecevit Yıldırım
8	Xelata Nobelê 2011 Bîrnebûn	33	Ödev Seyfi Doğan
9	Pêşangeha pirtûkan ya navnetewî 2011-Encam Agirî Soran	35	Ji bo bîranîna Av. Faik Candan Mem Xelikan
15	Serokvezîrê Danîmarka nû jinek e Metin Kara	37	Heval Mem Xelikan
17	Şirîka min Rahme Nesrin Bayram	38	Rosa Parks Seyfi Doğan
19	Kêza Haymanê Muzaffer Özgür	40	Mirina Piço û Qero Îbrahîm Korkmaz
22	Jîyana xortaniyê: Pîvank Nuh Ateş	44	Çend têbinî li ser 'MASUMLAR' ê Nuh Ateş
24	Li rojava tişteki nû tune Seyfi Doğan	48	'Mağdur ve mağrur toplumbilimci' Dr. İsmail Beşikçi Mehmet Bayrak
25	Arzûyên Jankêş Xizan Şîlan	57	Köken araştırmasında sözde kaynak kitap Dr. Mikailî
27	Hey lê Xezal Îbrahîm Korkmaz	68	17. Yıldız, Kürtler ve Aleviler Mehmet Bayrak

Ji bîrnebûnê

Erdhêj, tofan, şer, kuştin, serhildan, krîza aborî, "bihara ereban" û h.w.d., bi dehan bûyerên diltengiyê, mixabin di van sê mehên payîzê de, pir bi lez û bez rûdan. Berî her tiştî, em ji hemû xelkê Wanê re sersaxî û sebrê dixwazin û li vir, bi taybetî ji malbatên ku însanên xwe di vê qedestrofa xwazayî de wenda kirine re, dibên; serê we sax be. Êşa we êşa me ye, êşeka giran e!

Li gel vê êşa giran, em di malper, *twitter*, *facebook* heta rojnameyên li ser înternetê de, nîjadberstiya ku bi rêya mediya tirkî, di van salên dawî de li hember xelkê me bi awayekê hovane hatiye çêkirin, dibînin. Di rojên wiha de, divê însan hinekî bi merhamet bin!..

Hêvî û dawxaza me, bi taybetî ji desthilatdarên Tirkîyê ev e, ku ev dijminatîya ku tê avdan, bi dawî were! Bi salan e, di derheqê doza kurdî de, dezagahdarî li xelkê Tirkîyê têye belavkirin. Bi wan dezagahdariyana ev doza nayê çareserkin.

Xwendevanên bi rûmet, ji vê hejmarê pê ve hinek guhartinên biçûk,

ji aliyê form û nivîsan ve, hûn ê lê rast bîn. Bi van guhartinan, em dixwazin kovar hê hêsantir bêt xwendin û hinek çewtîyên termînolojîk bîn serastkin.

Bi ya me, ji wan kêmasiyan yek; me ji destpêkê heta niha, xwe wek *kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên Anatoliya Navîn*, bi lêv dikir.

Ev gotina "*Anatoliya Navîn*" rastiya kurdên me nedida. Ji vir û ha em ê li şûna Anatoliya Navîn, tenê bêbijin; Anatoliya.

Me di her hejmareka kovarê de daxwaz ji hevkar, dost û nasên xwe kiriye ku her çi, wêneyên cilûberg, serpêhatî, hekat, çirok, kilam, hebin ji kovarê re bişînin.

Em li vir careka din dixwazin dubare bikin ku em girîngiyekê didin folklor, ziman û kevneşopiyên xwe. Bi hevkarîya we, em dikarin hem kovara xwe, di vî warî de dewlementir bikin û hem jî ji xezîneya çanda kurdî re bibin alîkar!

Ez li vir, careka din dixwazim ji hevkar, hezkir û nivîskarên kovarê re bêjîm, em li benda nivîsên we yên kurdî ne!

Hewce ye zimanê me di her warî

de bi kar were! Ziman li benda we ye.

Ji kurdên Anatoliyê gelek hêjayiyên me hene. Di her aliyê civatê de. Hûn carcaran di nav rûpelên Bîrnebûnê de rastî çend navan bûne. Em li vir dixwazin navekî din lê zêde bikin. Ku umrê me zêde bibe, em ê ji vir û ha di her hejmarekê de, bi kêmasî navekî nû lê zêde bikin!

Hasan Hüseyin Deveci, navekî ji aliyê hunermendiya wênesaziyê ve têt naskirin. Me xwest em di vê hejmarê de wî bi riya hunera wî bi xwendevanên xwe bidin naskirin.

Deveci di sala 1972'an de li gundê Beşkardaşê, li Anatoliyê ji dayîk bûye. Ji sala 1995an vir ve li Almanyayê dimîne. Mamostê hunerê ye. H. Hüseyin Deveci bi navê Malmîme jî tê naskirin. Hunermend ev navê Malmîme, ji navê malbata xwe wergirtiye.

Xwendina xwe ya wênesaziyê, li bajarê Kölnê qedandiye. H. Hüseyin Deveci heta niha beşdarî bi dehan pêşangehan bûye û bi şeweyê xwe bal kişandiye.

Deveci wek pedagoğê hunerê, li KIK (*Kölner Institut für Kulturarbeit und Weiterbildung*) Enstîtuya Kolnê ya perwerdê û xebatkarên hunerê), *Akademie der Weltkunst*

(Akademiya hunerî ya çandên navnetewî) kar dike. Şewirmendê hunerê yê *Le Monde Diplomatique Kurdî* ye.

H. Hüseyin Deveci ji bo bingeha hunera xwe wiha dibê:

Min hîmê hunera xwe, li ser du feylezofên, ji du demên cuda de jiyane, ava kiriye.

Yek, Mevlana Celaddin-i Rumi ku dibêje; "Ev kesên ku eynî zimanê deng dikin ne, yên ku eynî hîsê parve dikin, karin hevdu fêm bikin"

Bertold Brecht jî dibêje: "Hemû huner, ji hunera herî bilind, jiyane re xizmet dikin."

Bi van herdu dîtinan hûn hunera H. Hüseyin Deveci li ser bergê dibînin.

Herwiha, nivîsên, folklorîk, çandî, hekat, serpehatî û lêkolînên dîrokî, ji hevkar û nûserên wek, Metîn Kara, Nesrîn, Bayram, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Seyfi Doğan, Xizan Şîlan, Îbrahîm Korkmaz, Ecevit Yıldırım, Mem Xelîkan, Dr. Mikaîlî û Mehmet Bayrak di vê hejmarê de bixwînin.

Bi hêviya ku ev hejmar jî, li gor dil û daxwaza we be, bimînin di xêr û xweşiyê de, heta hejmarê bê!

Ali Çiftçi

Xelata Nobelê 2011



Xwediyê Xelata Nobelê Tomas Tranströmer.

weke werger jî tê naskirin. Tomas Tranströmer di sala 1931an de, li Stockholmê ji dayika xwe dibe. Piştî dê û bavê wî ji hev vediqetin, ew li ba dêya xwe mezin dibe û Xwedê dizane ev jî ruhekî şairiyê lê peyda dike.

Hunera şairiya Tomas Tranströmer, li ser wezna antîk, zimanê wî metaforîk û xas e. Bi vê hunera xwe hîn di salên şestî de, bala xwendevanên xwe dikêşe û weke şairekî hemdema xwe tê naskirin.

Tomas Tranströmer di sala 1990î de tûşî nexweşiya felcê dibe û îro jî di peyivîna xwe de zehmetiyê dikêşe û nikane bipeyive. Tomas Tranströmer 80 salî ye.

Dîwana wî ya pêşîn bi navê 17 helbest, di sala 1954an de belav bûye û dûre jî gelek dîwanên wî yê weşiyane. Dîwanên wî li gelek zimanên din hatiye wergerandin.

Çendek ji dîwanên wî ev in:

Vediziyên di rê de

Asimanên nîvçe

Meydana kûvî

Efsûniya mezin

Golên rojhilat

Xelata Nobelê ya îsal bû para şair û nivîskarekî swêdî: Tomas Tranströmer.

Tranströmer, yek ji wan navên nivîskaran bû ku ji gelek salan ve her weke berendamê Xelata Nobelê, li ser dihat mînaqêşekirin. Lê îsal ev xelat bû para wî.

Li gor motevasyona akademiyê, nivîskariya Tomas Tranströmer tişteki weha ye ku ew bi gotinên xwe: *wênayên xurt û zelat nîşanî me dide ku em dikarin pê rêya rastiyê bibînin*.

Ji bilî şairî û nivîskariya xwe Tomas Tranströmer, psikolog bû ew

Bîrnebûn

Pêşangeha pirtûkan ya navnetewî

2011-Encam

Aqirî Soran

Encama pêşangeha Navnetewî ya 2011 an ya li bajarê Elmanya Frankfurtê.

Pêşangeha pirtûkan ya Frankfurt ê ya Navnetewî çiyê? (Frankfurt Buchmesse)

Pêşangeha pirtûkan, pêşangeha herî mezina pirtûkan ya cîhanî ye. Her sal li Frankfurtê li ciyê pêşangehan tête lidarxistin. Di pêşangeha Frankfurtê de ji sedî zêdetir welat beşdar dibin û bi hezaran sazî, dezgeh û weşanxaneyên wejeyê beşdar dibin. Her sal ji 100 hezarî bêhtir karmendên van saziyan û ji 200 hezarî bêhtir mêvan beşdarî pêşangehê dibin.

Amadeyiyên pêşangehê salekê berdewam dikin û berî bi şeş mehan her sazî û dezgeh li gorî pêdivî û mebestên xwe civanan ji kes û saziyên dîtir dixwazin, tevayî amadeyî ji bo na wan pênc rojên pêşangehê têne kirin.

Di pêşangehê de panel, semîner û civîn têne lidarxistin, hevdiştinên di

navbera weşanxane an jî nivîseran de têne pêkanîn, mafên pirtûkan ji bo çapxane an jî saziyên welatên dîtir têne dayîn.

Mebesta sereke ew e ku nivîs û wêjeya her welat û nivîserekî ji bo welat û xwendekarên welatên dîtir bête vegûheztin.

Di pêşangeha pirtûkan ya navnetewî de her sal welatek wekî mêvanê payebilind tête diyarkirin û ciyê herî zêde û mezin bo wî welatê tête dayîn.

Pêşangeha 2011 ê

Îsal nêzikî 7500î sazî, derdorê 150.000 karmend, nêzikî 250.000 mêvan beşdarî pêşangehê bûn. Di pêşangeha vê salê de, bi navê kurdan çar cî hebûn. 1. Hêvî Group-Rûdaw-Hawarnet, (Beşa 5.1) 2. Ciyê Başûrê Kurdistan (Beşa 5.0), 3. Weşanên Mezopotamya (Beşa 3.1), 4. Weşanên Bedîrxan-Komeleya Kulturî ya Kurd û Elman Mannheim (Beşa 5.0).

Hejmara karmendên van saziyên

kurdî: 20-25. Hejmara nivîskarên ku hatî pêşangehê: nêzîkî 10-12. Hejmara mêvanên kurd ku seredana pêşangehê kirî: 60 heta 100 kes. Hejmara kesên ku serdana ciyê kurdan kirî yê biyanî: 400-600 kesî.

Beşdarbûna Hêvî Groupê

Li gorî azmûna xwe ya heft salan ya pêşangeha pirtûkan Hêvî Group biryar da ku beşdarî pêşangeha pirtûkan a Navnetewî ya Frankfurtê bibe. Ji ber ku hersal pêşangeha pirtûkan ji bo herkesî sûddar û baş e lê bo me kurdan her çend hetanî nuha beşdarbûn hebe û kar hebe jî, li gorî wêje, çand û çonayetiya me kurdan ewqas jî berhemdar nebû. Ji ber vê yekê Hêvî Group biryar da ku îsal beşdarî pêşangehê bibe, pirtûk, nivîskar û weşanxanê kurdî bide nasîn. Di vê navberê de peywendî li gel *Hawarnet* û *Rûdawê* hate çêkirin. Van saziyên mezin yê kurd, *Koma Medya ya Kurdî Hawar Kurdistan Media Group* bi navê *Hawarnet*, Govara heftename *Rûdaw* jî bi navê xwe bi Hêvî Groupê re di nava hevkarîyê de biryar dan ku beşdarî pêşangehê bibin.

Ev hersê kom an jî saziyên kurdî yê zehmetkêş, bi derfetên xwe yê pareyî û berhemên di destê wan de, beşdarî pêşangehê bûn.

Di bernameya Hêvî Group-Hawarnet-Rûdawê de hebû ku berî her tiştî giringiya medya û wêjeya kurdî, nivîs û nivîskariya kurdî, bi kurdan û biyaniyan bidin nasîn û bidin zanîn. Di vê çarçoweyê de, amadeyî hatin kirin. Nivîskarên kurd, Helîm Yusiv, Jan Dost, Firat Cewerî, hunermendê kurd Nîzametîn Arîç, hatin vexwendin. Bê gûman bername ew bû ku nêzîkî 20 nivîskarên kurd bêne vexwendin lê mixabin ji bo berhevbûn û civîna evqas nivîskar pêdivî bi derfeteke zêde ya pareyî hebana. Ji ber ku bajarê Frankfurt dûrî gelek nivîskaran e, ji bo karekî wisan pêdivî bi derfeteke baştir hebû. Çend roj berî pêşangehê, nivîskar Firat Cewerî hatina xwe da rawestandî, ji ber wê yekê jî di bernameya Hêvî Group ya pêşangehê de, ciyê xwe negirt.

12.10.2011ê pêşangehê bi awayekî fermî dest pê kir. Li ciyê Hêvî Group-Hawarnet-Rûdawê, li herdû aliyên cî, ala Kurdistanê hat daliqandin, neqşeya Kurdistanê jî di nav ciyê pêşangehê de hat bicîkirin. Wekî dîtir gelek pirtûkên kurdî, piranî ji weşanxaneyê APEC, LÎS, AVESTA, ARAM, VATE û HANê gelek pirtûk ji weşanxaneyên dîtir hatin bicîkirin. Govara Rûdaw, jî bi neqşe û remzên kurdî, bi hejmara



Weşanên kurdî di pêşangeha pirtûkan ya Frankfurtê de.

xwe ya nû û yên kevin, pêşangeha xwe pêşkeş kirin.

Ji bo mêvan û serlêdarên pêşangeha Hêvî Group-Rûdaw û Hawarnetê, Govara Rûdawê hejmar xwe ya dawî wekî diyarî da mêvanan, Hêvî Gorup jî cilên ser (t-shirt) yên Kurdfm, carcaran pirtûk carcaran jî CDyên kurdî weke diyarî dan mêvanan.

Koma Hêvî Group û Hawarnetê bi koma xwe; Agirî Soran, Eyub Demir, Cotyar, Cuma Genc, Ciwan

Zagros, Îsa Alakîr ve karê xwe amade kirin û bi rêve birin. Rêvebirên Hêvî Group; Hevî Ernas û Hawar Salîh ji ber sedemên teknîkî nekarîn beşdarî pêşangehê bibin.

Rûdaw bi koma xwe: Mistefa Shefiq, Mansour Sedghi, Hêmin Ebdullah, Mistefa Chwartay, Hamdullah Yumlu, Nasredin Akyol ve beşdarî pêşangehê bûn.

Mêvanê yekem yê pêşangeha Hêvî Group, Rêvebirê giştî yê pirtûkxane û weşanxaneyên tirkîyê

Onur Bilge Kula bû. Rêvebirê tirkî li gel Rêvebirê giştî yê Hêvî Group Agirî Soran nêzikî niv demhijmêrê giftûgo kirin. Li ser helwesta Tirkîyê li himber çanda kurdî, hetanî nuha nêzikatiyên çewt û nêzikatiyên ku xisarê didin çanda kurdî, wêjevaniya kurdî û gelek mijarên dîtir yên çandî giftûgo hate kirin. Rêvebirê tirkî pirsiyara Melayê Cizîrî kir. Çend rêz ji vê giftûgoyê;

Rêvebirê tirk Onur Bilge Kula:
Gelo hûn Melayê Cizîrî çawan dibî-

nin? Kesekî çawan e? Kurd bi çi awayî lê dinêrin?

Rêvebirê Hêvî Group: Melayê Cizîrî ji bo me kurdan filozofek e, em Melayê Cizîrî tenê wekî şair û helbestvan an jî nivîser nabînin, Melayê Cizîrî bi tasawufa xwe û kûrayiya hizir û ramanên xwe, şewirmendî û hişmendiya xwe di dema xwe de ronahiya rewşenbîr û şairên rojilata navîn bû. Ji ber vê yekê ji bo me gelek giring e.



Dîmenek ji pêşangeha pirtûkan ya navnetewî li Frankfurtê.

Rêvebirê tirk: *Destnivîsa Dîwana Melayê Cizîrî di arşîva me de ye, me destana Mem û Zînê çap kir, em dixwazin ku dîwana Melayê Cizîrî jî çap bikin.*

Rêvebirê Hêvî Group: Baş e di çapkirina Mem û Zînê de hûn bi astengiyan ve nehatine rûbirû? Rêvebirê tirk: *Ji bo ku em çap nekin belgenameyên gelek berfireh derketin pêş me lê evana ji bo ku em çap nekin, nebûne sedem.*

Rêvebirê Hêvî Group Dîwana Melayê Cizîrî ya di pêşangeha xwe de diyarî da Rêvebirê pirtûkxane û weşanxaneyên Tirkîyê.

Di roja destpêkê û rojên dîtir de gelek kesên nivîskar û karmend bûne mêvanê pêşangeha kurdî. Di nava pênc rojên pêşangehê de, nûnerê Wezaretê Rewşenbîrî û Lawan yê Kurdistanê birêz **Muhsîn Osman**, mamosteyê Zankoya Bexda birêz **Doktor Adil Germiyani**, berpirsiyarê Weşanxana Bedirxan birêz **Hemîd**, berpirsê Kurdistan 21 birêz **Mumtaz Herîrî**, karmend û admînistatorê EDV birêz **Basein Maulud**, serokê Yekîtiya Nivîskarên Tirkîyê (PEN) birêz **Tarik Gûnersel**, Kurdistan TV bi rêka birêz Zinar Shîno, rêvebirê NAVEND (Zentrum für Kurdische Studien e.V) birêz Metin Incesu, siyasetmedarê kurd ku di partiya

Elmanan DIE LINKE de çiyê xwe digre **Giyasettin Sayan**, hunermendê kurd **Behcet Yahya**, nivîskar **Bextiyar Elî**, nivîskarê kurd birêz **Helîm Yusiv** (mêvanê vexwendî yê Hêvî Group), nivîskarê kurd birêz **Jan Dost** (mêvanê vexwendî yê Hêvî Group), hunermendê kurd birêz **Nîzamettîn Arîç** (mêvanê vexwendî yê Hêvî Group), nivîskarê kurd birêz **Zeynel Abidîn** (Bi pirtûkên xwe ve bi Hêvî Group ve karên xwe pêşkêş kirin), nivîskar û helbestvan **Perwîz Cîhanî**, nivîskar û wergêr **Mehmet Gultekin**, nivîskarê kurd **Mîr Qasimlo**, nivîskar û siyasetmedar û parêzerê kurd **Serhat Bucak**, hunermendê kurd **Hejar Temo**, mamoste û nivîskarê kurd **Fêrgîn Melik Aykoç** û hîna gelek nivîskar, karmend û kesên navdar yê elman û biyanî serdana pêşangeha Hêvî Group-Hawarnet û Rûdawê kirin.

Roja dawî, nivîskar Helîm Yusiv, Jan Dost, Perwîz Cîhanî, Fêrgîn Melik Aykoç xwe ji bo mêvanên amade, xwe dane nasîn û pirtûkên xwe û karên xwe yê nû dane zanîn. Hunermendê kurd Nîzamettîn Arîç jî albûma xwe ya dawî ya bi navê Azadî ji bo mêvanan da nasîn û bi wajoya xwe belav kir. Di heman demê de nivîskaran jî berhemên xwe bi wajoyên xwe ve dane mêvanan.

Dawiya pêşangehê rêvebirên pêşangehanên kurd, yên Hêvî Group, Rûdaw, Weşanên Bedirxan, berpirsiyarê Wezareta Rewşenbîrî û Lawan yê Kurdistanê, rêvebirê Weşanên Mezopotamya li hev civiyan û pêşengah û rewşa xwe şirove kirin. Berî her tiştî bi hevbeşiya beşdarvanan ve hate diyarkirin ku bi vî rengî belavbûn û parçebûna pêşangehên kurd ji bo kurdan ne rewşekî baş e û ji bo karên kurdewarî rewşeke xirab e. Him mêvan û him karmendên pêşangehên kurd ev rexne û nêrîn bi her rengî diyar kirin. Di civîna van koman de hate diyarkirin ku berî hertiştî di pêşangeha sala 2012ê de divê ku kurd an di bin yek sîberê de an jî li cem hevdu bin. Him ji bo ku mêvanên kurd karibin her tiştê kurdî li ciyekî bibînin û karibin yekser xwe bighînin pêşangehên kurdan, him jî ji bo ku ciyekî baş di pêşangehê de bête girtin da ku di salên dahatî de dewrekî baştir bête leyistin pêdiviya li cem hevbinê an jî yekbûnê hate diyarkirin. Berpirsiyarên Rûdaw û Hêvî Groupê vekirî dane diyarkirin ku eger hikumeta Kurdistanê û Mezopotamya serkêşiya komên kurdî nekin û ji bo ku bêne cem hev hewl nedin û biryar nedin, ewana dê bi derfetên xwe û bi çend kom

û weşanxaneyên kurdî ve ji bo sala nû ciyekî mezintir û baştir bigrin û bi awayekî gelekî berfirehtir beşdarî pêşangeha navwelatî bibin. Ji ber vê yekê jî hetanî dawiya vê salê divê ku Wezareta Rewşenbîrî û Lawan ya herêma Kurdistanê biryara xwe an jî nêrîna xwe di warê pêşangehê de ji bo van komên dîtir û çapemeniyê bide diyarkirin. Di heman demê de Weşanên Mezopotamya jî divê ku ji bo beşdarbûna nav komên kurdî an jî li cemhevbinê biryara xwe bide diyarkirin, eger na Hêvî Group bi Rûdawê, Weşanên Han, Hawarnet û gelek komên dîtir ve di sala nû de dê bi awayekî xurtir beşdarî pêşangeha navnetewî bibin.

Di dawî de Hêvî Group diyar kir ku heman wekî rêvebirên giştî yên pêşangeha Frankfurtê ewan jî ji roja destpêkê roja yekem ve dest bi amadeyiyên sala bêt kirin û ji nuha ve çavliroyî sazî, nivîskar û dezgehên kurdî ne da ku pêkve beşdarî pêşangehê bibin. Berî her tiştî bang kirin ku weşanxane û nivîskar mafên pirtûkên xwe amade bikin ji bo firoştinê da ku ew karibin di vê pêşangehê de pirtûkên kurdî pêşkêşî welat û weşanxaneyê biyanî bikin da ku bi zimanên dîtir jî bêne weşandin.

17.10.2011

Serokvezîrê Danîmarka nû jinek e

Metin Kara

Li Danîmarkayê piştî deh salan hikûmatê dest guherand. Koalîsyona partiyên çepgirî piştî deh salan îktîdar ji dest koalîsyona rastgirî girtin. **Helle Thorning Schmidt** bi vê şiklê cara yekemîn bû serokwezîra Danîmarka ya jin.

Koalîsyona rastgirî îktîdara xwe deh sal in ku bi desteka partiya nijadperest berdevam dikir û zêdetir kanûnên bê musamaha ji bo biyaniyan dihanîn rojevê.

Li gorê vê yekê hîlbijartina Danîmarkayê hem ji bo Danîmarkayê hem jî ji bo hemû Ewropayê dîrokî bû. Bi rastî jî berjorçûna politikayên rastgirî li Ewropayê rawestiya. Netîceya hîlbijartinê bi vê şiklê bû: bloka çepgirî ji sedî 50.3 deng wergirt û 89 parlamenter kesiband, bloka rastgirî jî ji sedî 49.7 deng wergirt û 86 parlamenter kesiband.

Nufusa grûbên ji biyaniyan ya herî bilind li Danîmarkayê kurd in. Dengdêren kurd li gorê texmînan nêzikî 15 hezaran e, lê beşdariya kurdan ya hîlbijartinê nêzikî 6 hezaran bû. Namzetê kurd jî vê carê zêde bûn. Ji Partiya Sosyalîst 3 kurd namzet



Helle Thorning Schmidt.

bûn, ji navenda paytextê **Özlem Çekiç** (Hecmeran), ji herema paytextê ya mezin jî **Bilal İnekçi** (Încov) û **Serdal Benli** (Bûmsûz) namzet bûn. Dîsa ji Partiya Sosyaldemokratên li



Özlem Çekiç

herema peytaxtê **Yıldız Akdoğan** (Çorûm) namzet bû.

Berî hilibijartinê li gorê texmînên analîstan namzetên kurd yê şansa xwe herî mezin **Bilal İnekçi** û **Yıldız Akdoğan** bû. Lê ji her 4 namzetên kurd bes **Özlem Çekiç** di dema dawiyê da wek parlamentera kontenjan kete parlamentoyê. **Bilal İnekçi** herçiqas dengên şexsî têra xwe girtiba jî lê partiya xwe bi awayekî rekor deng kêr kir û ji 23 parlamenteran daket 16 parlamenteran. **Bilal İnekçi** di herema xwe da di rêza 2an da bû û gerek Partiya Sosyalîst 17 parlamenter derxistibûya ku **Bilal İnekçi** jî biba endamê parlamentoyê.

Serdal Benli jî di eynî heremê da di rêza 5an da bû û ihtîmala xwe yî parlamentoya zatî kêr bû.



Yıldız Akdoğan

Dîsa **Yıldız Akdoğan** bi ber deng ketina partiya xwe, Sosyaldemokraten ket, lê eger bes 4 dengên din yê şexsî wergirtaya dikarî careke din bibe parlamenter. Eger **Yıldız Akdoğan** biba parlamenter navê wê ê di çapemeniyê da wek wezîra yekemîn bi eslê kurd û biyanî derbas bibûya.



Bilal İnekçi



Serdal Benli

Şirîka min Rehme

Nesrin Bayram

Di destê min de kamera hebû û ez çûm aşxaneyê xaltîka Nûrê.

Di aşxanê de bûkên xaltîka Nûrê û keça wê ya li gundê Kûtûkê mêr kiribû, hebûn. Li kêleka hevdu bi rêz rûniştibûn û li pêşiya wan textê nan hebû û mijûlî nanpêjanê bûn.

Rehme li ber sêlê bû û nan sor dikir, bûkên din ên xaltîka Nûrê, Arefe û Ayten û keça wê Zelîxa jî, ji Rehme re hevîr vedikirin û didan wê.

Di sekna wê de xuya bû ku hemû karê wê malê ji aliyê Rehme ve tê rêvebirin.

Nûrê û Zelîxa jî bo Rehme hevîr vedikir. Sekna wê ya bi xwe bawer nîşan dida ku karê wir hemû ji aliyê wê ve tên birêvebirin.

Dema yê ber destê Rahmê sist dibûn, Rahmê bi kirdenekê li textê nan dida û ji wan re digot ranezên.

Min jî hêdî hêdî, kamera danî ser milê xwe.

Bûkên din jî, ji min re wiha digotin, “wîî nekişîne lê!” şirîka min Rehme, hêrs bû û wiha got, “Bihêlin bila bikîşîne, çima hûn cahiltiyê dikin. Ev dîmen heta em hebin dê bimînin.”

Rehme, bûka xaltîka dayika min

bû, hindî tê bîra min ez wê nas dikim. Zarokatiya me her li mala wan derbas bû.

Mêrê Rahmê Zekî, bi bavê min re diçû geriyane û ligel bavê min şagirtî dikir.

Dema ji seferê vedigeriyar, hinek caran li mala wan û hinek caran jî li mala me kom dibûn.

Pir xweş tê bîra min, Rehme bi mêrê xwe û herdu zarokên xwe ve li xaniyekî herî yê birayê xwe de rûdiniştin.

Li kêleka wê malê, maleke din jî hebû û du jûrên wê hebû. Ew jî ji aliyê birayê wê ve weke dikan dihat bikaranîn û tê de tişt-mişt difrot.

Min bi xêra wêrektî û xwe-bawerîya Rehme, dîmena xweşik ya aşxaneyê kişand kamerayê. Min texmîn nedikir ku ez ê bikaribim ji bilî wê dema ku dikişand kamerayê, Rehmê bibînim.

Lê heta ku ez li Tirkîyê bûm, hema hema her roj min Rehme didît.

Gelo çima?

Ji ber ku Rehme, li herêma Anatoliya Navîn de, jina herî çalاک bû ku min nas dikir, derbarê hemû gun-

dan de agahiyên wê hebû, ew devera hemû baş nas dikir û cihê hertiştêkî dizanîbû, yanê dinyayek mezin di laşekî biçûk de bû Rehme.

Helbet, şiyar û zanabûna wê bi vê ve jî sînordar nebû, ez carekê bûm mêvana wê. Min dît ku digel cîranên xwe pir baş e û dilê tu kesî ji xwe nahêle û dayikek fedakar û hevjinêk baş bo mala xwe bû.

Ji wê rojê ve em bi hev re li gundan digeriyan, di her warî de ji min re dibû alîkar. Ji ber ku derbarê her gundekî de, çîrokek dizanîbû û cihê herî xweş bo kişandinê li wan gundan dizanîbû.

Helbet ez û wê, em car car li hev jî diketin, yanê me şer dikir, mirov nikare bêje şer, lê hinek caran gotinên me li hev xweş nedihat. Lê zêdebarî hemû tiştêkî, niha dema ew tê bîra min, ez li hember wê hezkirineke mezin hîs dikim.

Ez ji wê re dibêjim, mirova herî rind a gundê me.

Ew êdî şirîka min e û ez heta hebim dê wisa be, Xwedê ji xweşiya wan tiştêkî kêr neke. Her çiqas te car caran ez hêrs kiribim jî lê ez pir ji te hez dikim, Rehme malê Asaf.



Çend xanimên kurdên Anatoliyê bi alîkariya hev nanê şikeva çêdikin.

Kêza Haymanê*

Muzaffer Özgür

Tê zanîn ku ji şerê cîhanê yê yekem û bi şûnda, li Anatolîyê şer di navbera tirk (bi alîkarîya kurd û çerkezan) û yonan de berdawam kiribû. Leşgerên yonan Anatolî heta dor Enqerê bindest kiribûn. Di wî şerê Anatolîyê de leşgerên yonan hatibûn here- ma Anatolîyê jî. Li gundên kurdên Anatolîyê tirs ketibû dilê gel. Ji bona ku ar û namûsa xwe biparêzin, gundîyan keç û bûkên xwe ji gundê xwe bi dûrdixistin an jî dema yonan hat li dor alîyê gund û mala mêze dikirin ew vedişartin. Hekata me jî li ser wê ye.

Li gundekî kurdan yê heremê, li malekê qîzeka pir delal hebûye. Navê xwe Kêzê bûye. Salê wê 17- 18 bûne. Rindîya wê ji gundên cîran va jî dihatiye zanîn. Pir xortên heremê daxwaz kirine ku bi delala deşta Haymanê re bizewicin. Pir axler û begler, xort û mezin, dewlemend û xizan hatine ji bavê wê ew xastine, lê

wê qabûl nedikiriyê. Dê û bavê wê û malbata wê daxwaz dikirine ku wê bi pismamê wê re bizewicînin. Lê qîza malê ev daxwaza malbata xwe jî erê nedikiriyê.

Şevêkê yonan hatiye doralîyê gundê wan girtîye, wan nedikanîye ji gund derkevin û berê xwe bidin rojhelat, berva Enqerê herin. Malbatê xwestiye ku qîza xwe veşêrin lê bêçare bûne.

Bavê qîzê planekê dike û bi alîkarîya malbata xwe di aşxaneyê mala xwe da di baceya agirdangê (ocax) de qîza xwe vedişere. Ji bo çend rojan xwarin û vexwarina wê jî dikin baceyê. Û bi kerpîçan dîwarekî li ber çêdikin.

Pismamê Kêzê jî pir daxwaz dikiriyê ku bi dotmama xwe re bizewice lê wê qebûl nedikiriyê. Ji ber wê jî ev pir aciz bûye. Hertim daxwaz dikiriyê ku zîyanekê bide wê.

Dema leşgerê yonan hatin ketin

**Va hekata min ji pîrika xwe bihistibû. Çend pîrejînên gundî me jî ev hekat rast kirin. Lê ev rast bû an jî ji ber politikayên tirkan ev ketibû nav gel, nayê zanîn. Min stran ji bîr kiriyê. Hekat bi versiyoneka din bi tirkî jî tê gotin. Di versiyana tirkî da navê jinê Kezban e. Dema di behrê da berva İzmirê tê, her sê zarokên xwe davêje behrê û dibêje: "Ma bizrî yonan bi min re nê welatê min."*

gund, ew hemû mêran li meydana gund berhev dikin û dîtînen xwe û hatina xwe ji wan re eşkere dikin. Ji bo xwarina leşgeran û yêmê hespên xwe alîkarîyê dixwazin. Di mala kê da çend kes hene gerek gundî wan agahdar bikin. Sozê didin wan ku eger ew tu îxbar û îxanete nekin, tu zerar û zîyanê nadin mal û canê wan. Gundî li hev kom dibin û biryarê digirin ku her malek pezekî bide wan û ji bo hespan jî mêrg, ka û malbatên dewlemend jî ceh bide.

Dema gundî ji bo xorintên xwe wan agahdar dikin, bavê Kêzê behsa wê nake. Leşger jî bi mal mal digerin, mêze dikin. Pismamê qîzê tere ba serleşker û mala apê xwe îxbar dike. Behsa vêşerandina(veşartina) dotmama xwe û derewên apê xwe dike. Serleşker hema fermanê dide û leşkerê xwe dişîne malê. Mal tê kontrolkirin. Dîwarê ku nû hatî lêkirin tê dîtîn. Leşger dîwar dixelînin û Kêza wek roj dibiriqî derdixînin, dibin ba serleşgerê xwe û bavê wê jî binçav dikin.

Dema serleşker rindê dibîne pir kêfxwaş dibe. Bavê Kêzê tê êşkencekirin. Serleşker ji bo kêfa xwe, wê li ba xwe digire. Yonan terin û serleşker rindê bi xwe re dibe.

Ji bo birina Kêzê gundî pir aciz

û bêçarê dimînin. Ji ber ku namûsa wan dikeve bin destê yonan, ciwanên xwe bi dizikî dişînin şer. Diya Kêzê bêzar dimîne û ji ber girî çavekî xwe kor dibe. Dema jinên cîran daxwaz dikin wê îşmar bikin vê stranê tîne ziman.

Îşbû îşbû, Kêzê îşbû

Yonan ji mala xwe yermiş bû.

Ji Enqerê re li têlê xin

Îrz û heya batmiş bû.

Wextekê bi şûnda yonan di şerê Anatolîyê de têk terin û paşda berwa behra rojava direvin. Serleşger qîza kurd bi keştîyekê bi xwe re dibe welatê xwe. Li wir pê ra dizewice. Wan li welatê Yonan, li bajarê Athenayê dijîn û sê lawên wan çêdibin.

Çavên Kêzê hertim li behrê bûye. Ji zarokên xwe re bi zimanê dayîka xwe stran û hekat gotine. Herroj girîyaye. Lê merê wê nexwastîye ku ew bi zarokên xwe re bi kurdi deng bike. Ji bo wê jî di malê da ji bo Kêz bi zimanê yonanî hîn be kursên ziman tê dayîn û zarok bi dayîka xwe re mecbûr dibin ku yonanî xeber bidin.

Çend salan bi şûnda rojeka havînê jina kurd li kêleka behrê bi lawên xwe

va gerekê dike. Li kêleka behrê kesên bi tirkî deng dikin dibîne û dixwaze bi wan re deng bike. Dema jina kurd tirkan silav dike, ji ber nezanîna xwe ya tirkî, aciz dibe.

Yek ji wan jî kurd dertê. Ew jê dipirsin ku ew çawa hatiye wan deran. Çîroka xwe bi alîkarîya wî kesê kurd ji wan re eşkere dike. Ew pir pê dêşin. Dilê wan xemgîn dibe. Kêz bi wan re dibêje:

– Ez dixwazim bi we re herim welatê xwe. Pera bidim we û hûn bi dizikî min bibin welatê min. Tirk ditirsîn lê ev daxwaza wê di dile wan de êşekê çêdike. Ew dibêjin, em çend rojan li vir in. Gerek em bifikirin.

Jina kurd tere mala xwe. Evarê xew nakeve çavên wê. Roja din carek din tê cem karkerên keştiyê. Biryara xwe carek din ji wan re dibêje. Ew qebûl dikin. Kêzê li mala xwe zêr û zîvê xwe digire, roja ku derkevin rîya Anatolîyê, ji zarokên xwe re dibêje:

– Em ê îro herin behrê û bi keştiyê bigerin. Ew bi alîkarîya karkeran bi dizikî li keştiyê sîyar dibin. Kêz ji zarokên xwe pir aciz dibe. Dixwaze wan bikuje. Çend rojan bi şûnda keştî tê bajarê İzmirê yê welatê Tirkîyê. Kêzê zêr û zîvên xwe dide karkerên keştiyê. Bi alîkarîya wan jî tere Enqerê û gundê xwe ba malbata xwe.

AGAHDARYEKE GIRÎNG

Em dixwazin di her hejmareke xwe de, ji cil û bergên kurdên Anatoliya Navîn wêneyekî kevn di **Bîrnebûnê** de biweşînin. Bi vî awayî em ê hem bi tevgirêdana kurdên Anatoliya Navîn bizanin, hem jî em ê hay jê hebin ku kincên wan ên berê bi çi awayî ne.

Bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatoliya Navîn didin zanîn ku: wêneyên kesên ji malbatê (jin-mêr), bi kinc û tevgirêdanên kurmançiyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopiyekê bi rê bikin. Bi vê yekê em ê bi dewlenediya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr bînin.

Redaksiyon

Jîyana xortaniyê: Pîvank

Nuh Ateş

Li gundê Xelika, xortên zemanê min biharê diçûn pîvanka (pîvok, pîvonk). Ez jî pir çûm pîvanka û bûme şahîdê serhatîyên gera li pîvanka. Vîqasî ku di bîra min da maye, biharê xortên gund yê mal û mihelêyên cîran kom diwûn û diçûn pîvanka. Sewa vê, ew jî gund şeş û heft kîlometroyê bi dûr diketin. Hîngê xort diçûn xilf, gizerê bejî, kuvanik û kerenga jî. Keçîk û bûk ne diçûn pîvanka, ew pirtir diçûn emtirşik û merdîmelax û xerdelê.

Pîvank kulîlkeke narîn û bi şuhret e. Ew ê reng bi reng e, geh sipî geh jî mor û zer e. Mîna gul û çiçekên din yê bejî, ew pirtir li tunc û qerecan û li nav xozanan (aniz) jî dirûze û tê xwarinê. Ku wextê xwe hat, gula pîvankê bi pelên xwe yê hêşîn va derdikevin ser herdê. Kokê pîvankê kêmtirî bihostekê di herdê da ye. Serîyê kokê pîvankê qîlot û vîqasî pişkulekê ye. Me qalîkê kokê pîvankê yê qehwereng sipî dikir û pelên wê yê mîna dezîyê zirav jê vedidan û yê mayî dixwar. Tamê xwe pir xweş bû. Carnan me pîvankên sipîkirî, serî li hêlekê û boç li hêlekê di hev girêdandan mîna gulîyekî dihanan.

Her xortekî çoyekî xwe yê pîvanka hebû. Serîyê çoyê berve jêr tûjkirî bû. Bi çoyê, me pîvank jî herdê radiki-

rin. Pozî çoyê yê tûjkirî me ber dida herdê. Sewê ku çoyê rind bi herdê da here xwarê me bi destekî xwe bi serê çoyê jor û bi destê din jî bi nava çoyê digirt û bi zîkê xwe bi çoyê ra dina. Bi zîkê bi çoyê rananê zîkê me diêşî.

Li ser êş û talukeyên jî vê melê da, qala serhatîyên bi tirs dikirin. Ku ez ne yî şaş bim, kilamek hewû, digotin ew ê li ser lawîkekî ku çoyê pîvanka û bi çoyê jî zîkê da birindar bûye yan mirîye hatiye stran. Çend rêzên wê yê ku di bîra min da mayî ew in:

*Memo Memo Memo lawooo
li terlê golê ramedîyawooo
pîyê rastê di bin da mawooo
bi yê çepê li ber xwe dawooo*

Em li cihê kû pîvank li dirûztin belav dibûn û bi çavên belkirî li pîvankan digerîyan. Li gorê nîstî û edetên hîngê me rembil diavêt. Bi nowê, her xortekî çoyê xwe bi nêta ku çoyê wî li cihê pîvankê pir lê rûzî bê xwarê, pîr berve hewa diavêt. Di pey va jî hema dibezî cihê ku çoyê wî li ketiye xwarê û ew dera jî xwe ra xelkeqî çizî dikir. Ew dera dibû milk û nesîbê wî û ew li wir li pîvanka digerîya. Va merasîma dubare û sêbare dibû.

Rojekê, wexta pîvanka wû û heyamî xwaş bû, ez jî tevê, xortên meheleyê kome ser hev bûn û çûne

pîvankan. Me qerar dabû, li gorê daxwaz û fermanê serdarê xortên miheleye, Hemîdo em ê berva axzê yaylê Oskê Osmên biçûyana pîvanka. Li wir him li tûnc û qeracên navbera zevîyan û him ji li nav xozanan pîvank pir dirûztin. Zevîya Çuçê li wir bû û li nav wê pîvank pir wûn. Hemîdo serdarê xortên mehelê wû. Xortekî bi hêrs û tûj bû. Gotina wî ferman bû. Li ber wî helnanê ra bê tehemul wû. Li gora heşgihêştina xortaniya wê wextê, edeleteke wî ya primitîv hewû.

Me tevderiyên xwe kirin. Her xortekî çiqinek xwe hewû. Çiqin geh destmalek geh jî turik û parzinek wû û tê da tiştê xwarinê weşartiwû. Xwarin pir cara çolerûn, hek û pîzav wûn. Berî nivro me da rê. Em di newalê kêçel ra derbas bûn. Li alîyê jor yê zevîyê malê Hecî, me merasên (sol) xwe êxistin û kirin herdê û xwelî bi ser kir. Bi merasan di nav zevî û şûvan (hêrgan) ra bi rê çûyîn ê bi zehmet wû. Xwelîya teze bi binê merasan da dinûskî û pê nig li meriva giran diwûn. Pêxas bi rê çûyîn jî bi zehmet wû lê bi zewq wû jî. Bi nigên xas û derdawên helmaştî meriv xwe pê sivik û hêşyar hîs dikir. Ku te pêxas pêle herdê dina, sêrinîya herdê li nav canê te belav dibû.

Bi lez û bez em gihêştin cîhê ku em ê biçûyana. Her kesekî li ber xwe dida ku ji yê din pirtir pîvankan rake. Em ketibûn pêşbazîya pîvankan. Me rembîl avêt û herd xelkekî bir û parve kir.

Me têt pîvank hel kirin.

Wext rabirt, danê evarê em vege-rîyan û hatin şûna ku me meras lê kiriwûn herdê. Li wir em gavakê man, me vesinîya xwe helna. Pêçekê bi şûn da, Hemîdo got, „her kes pîvankên xwe bihêjmire!“. Her yekî ji me pîvankên xwe hêjmartin. Kesê ku pirtir pîvank helkirî Miçoyê Elî bû û di pey wî birayê wî Oso pir pîvanka berehev kiriwûn. Her du bira jî pir jîr û destpît wûn. Yê ku ji me gîştkan hendiktir pîvank rakirî Meho wû. Viqasî ku tê bira min, wî 75 pîvank rakiriwûn.

Hemîdo got, “her kes ji pîvankên xwe 75an ji xwe ra vede yê mayî bavê ser vê destmalê û em ê wana li hev adil parve kin û parê me gîştkan bikin yek!” Dûv ra, wî destmala xwe li herdê rêxist. Edeleta Hemîdo ne bi dilê Miço û birayê wî bû. Ew bi parvekirineke bi vê şeklê razi nebûn. Miço got, “Xwedêkî me heqê kê xwarîyê? Pîvankên ku me bi dest û pîyên xwe helkirî heqe me ye!” Oso jî xwe da pişta wî.

Li ser vê, di navbera Hemîdo û berdevkên wî û her du birayan da şorên nexwaş hatin kirin û hing derket. Miço û Oso ji ya xwe danegerîn û rabûn ji koma hevalan veqetîyan û çûn mal. Yê mayî, ez jî tevê, bi gura Hemîdo kirin û para pîvankên xwe wekî hev kirin û paşê dev dana rîya gund.

Elmanya, 15.03.2011

Li rojava tişteki nû tune

gotin em bira nin
hezar gund şewitandin

me got em wek xwang û bira nin
hezar gund şewitandin

gotin em goşt û neynûk in
hezar gund şewitandin

me got em wek goşt û neynûk in
hezar gund şewitandin

gotin me keç dan û sandine
hezar gund şewitandin

me jî got me keç dan û sandine
hezar gund şewitandin

gotin em î ji ometê muhammed in
hezar gund şewitandin

me jî got em î ji ometê muhammed in
hezar gund şewitandin.

velhasil
bi hezaran gund şewitandin

Sevfi Doğan

Arzûyên Jankêş

lê lê kezîzerê
ez êş û janên evîna dilê xwe yê ehmeq
mîna secadeyek reş
li ber lingên te yên narîn
radixim
germa dengê gewriya te
di paranteza deftera çaxên westiyayî de
diparêzim
konê hesreta xwe yê koçber
li ser dermanê lêvên te yên hingivî
vedigirim
were bi lezeta zimanê şîrîn
li ser birîna kezeba min
duaya nêmeja nûraniyê
bixwîne
bi bejna xwe ya fodil cîlweyên nazdar
li dor xemkêşiya awirên min
bigerîne
riya hezkirina newalên pêşîra xwe
ji min re veke
qêrîna dergûşa nava dilê reben
aşt bike
tu
him dilê min yê şûm
li bendemana xwe nexweş dikî
û him jî bi bedewiya bejna zirav
şewata birîna cîgera min derman dikî
li hesretkêşiya te
gul û nêrgîz û sosin
li gulîstanan êdî napişkin
were bibe
pirpirika biharên hestên fedyok
û li ser çiçekên bedena çilmisî

venîşe
bibe dermanê şaxê kul û derdan
xewna şev û rojên perîşan
çirûska awirên jankêş
bibe melhema çokên qerimî
teseliya qeyrana giyan
zelaliya ava çemên şêlû
bibe şewqa tîrêjên qiblegeha min
herika kaniya helbesta nîvco mayî
zimanê çîrokên dapîra min ya jibîrbûyî
bibe fala çarenûsa dahatûya min
peyva ferhenga destanên berbabûyî
lorîna stranên welatê dengbêjan
bibe stûna koza malwêraniya min
ez
serma laşê xwe dispêrim
keservedana qefesa te ya germ
li seyrana zozanên bêxwedî
ber bi govenda xemla bûkaniya te ve
dimeşim
tiliyên xwe yên lertzok
li ser şopa kenê te ya şahane
digerînim
xunava şhweta lêvên qelişî
li ser navika te ya nermik
diherikînim
li ber sînga te ya qedîfe
ji sermestiya eşqa şeydayê
dîn û har dibim
li kalbûna salên bêteqet
sewta êvarên te yên xweşik û nazik
diramim

Xizan Şilan

2010-05-05, Stockholm

Hey lê Xezal

Îbrahim Korkmaz

Hey lê Xezal, ez ê konê malê bavê xwe terk kim
Ez ê herime serê çiya, ji te re bayîn kim
Eger yara min dengê min nabîze
Ez ê bi çûçika Xwedê te re silav kim

Hey lê Xezal, ji bo te bûme koçer im
Li çiya û baniya li te digirim
Were keviya mala min rûne
Stêrên çavê min diherike bimalîne

Hey lê Xezal, ez ê simêlê xwe reş badim
Ez ê nîşangeha zêrînê hustî te da dadim
Eger yara min pê qîym nabe
Ez ê gerdenê mircanî ser sînga te da berdim.

10.09.2011 / Danmark

Rojek ji rojiyê, terawî û okey

Ecevit Yildirim

Dawiya salên 80î, li gundekî Almanyê meha rojî û remezanê bû.

Em jî çar hevalên xort bûn. Faro, Miço, Ehmed û ez.

Faro ji Altilerê lawkê Hecî Osî Îwikê bû. Miço ji Omera lawkê Hecî Kewikê û Ehmed jî birayê wî yê piçûk bû.

Di nava me da, Miço hevalê me yê herî mezin bû. Ew bi qasî du-sê salan ji me mezintir bû. Ne tenê bi sala, bi rabûn û rûniştina xwe jî, Miço dixwest xwe wek mezinekî nîşan bide. Çi li dilê dê û bavên me dihat, wî wer dikir.

Şîretên ku dê û bavên me li me dikirin, Ehmed, Faro û min me piştguh dikir. Lê belê Miço bê qisûr xwe lê digirt. Bi taybetî jî di mijarên dîni de Miço pir hesas bû. Gava me digot em herin xwe li avê xin, Miço digot: “Herkes xwe li wir tazî dike, eyb e û bi gune ye!” Yan jî gava me digot; Em herin bi şev ji xwe ra tenekê bigerin, Miço dîsa li gor referansên dîni li dij derdiket.

Rehmetiyê Hecî Kewikê ji Miço pir bi hêvî bû û digot: „Ji Miçkî me, mêrekî cimata wê bi derkeve!”

Miço tenê di mijarekê de şîretên

dê û bavên me ji bîr dikirin. Ew jî okey bû. Miço lîstikvanekî okey yê baş bû. Gava Miço bi okeyê dilîst, xwe ji bîr dikir. Bi ruh û can dikete nav. Miço bi şev û ro okey bilîsta jê têr nedibû.

Rokê dê û bavên wî bi hev ra çûn serdana malbateke nas li bajarekî dûr.

Em jî wê rokê bi tenê man. Li derva eyam pir germ bû. Li ezmana ewrek tenê jî tunebû.

Em bi destekî zû li hev civiyan û ketin nav mînaqêşeya plan û programa rojê.

Faro înişyatîf wergirt û got: „Îro eyam pir germ e. Heta fitar tê, em ji xwe ra herin xwe li avê xin û dûra jî em ê werin xwarina xwe ya ji bo fitarê hazir kin.“

Miço cîlê li dij derket û got: „Di vê roja bimbarek a remezanê de karê me li nav taziyan çi ye? Herkesî xwe daye ser nimê û quranê, tu jî qala xweliavêxistinê dikî. Bi Xudê pir bi gune ye!”

Pêşniyara Faro di cîh de bû. Faro, a di dilê me de anîbû ziman. Ji ber em gîştik bi rojî bûn û eyam jî pir germ bû. Me ê bi pêşniyara Faro heta

dema fitarê xwe hênik bigirta. De tu were wê, me ji Miço nediwêrî.

Miço bi wê jî nema û got: “Em ê îro heta dema fitarê, avdesta xwe helînin, quranên xwe vekin, quranê bixwînin û nimêya xwe bikin. Bila sewaba me zêde bibe. Em ê mikafata wê li dinya alî dîn bibînin.”

Pêşniyara Miço qet ne li gora dilê me bû. Lê belê me Miço jî nas dikir. Miço carekê bi ya xwe kir, ne mimkîn bû jê vegere.

Ehmed, Faro û min, me bi awayekî bêçare li çavên hev mês dikir.

Dû ra Ehmed bi dengê nizm pêşniyareke xwe kir û got: “Em meresên xwe li pê kin û herin li qada topê ji xwe ra bi topê bilîzin.”

Miçê me bi wê pêşniyarê jî serê xwe li ba kir û nehate ser.

Ez difikirîm ku Miço çing ji ya wî bikim. Min di ber xwe da got, Miço were ser, were ser, yê bi okeyê were ser.

Min got: “Miço, kes ji me naxwaze quran û qesîdeyan bixwîne. Madem tu naxwazî em herin xwe li avê xîn, wê çaxê em isqartayên okeyê derxin û ji xwe ra okeyê bilîzin. Ji xwe em çar kes in jî.”

Gava Miço navê okeyê bihîst, kir kume kum, sist bû û got: “Yaw okey di eslê xwe da ji kar û lîstokên şeytan e. Him di vê rojî û remezanê de jî, gunehên wê du cara li rojên din tên hesapkirin.”

Faro hevalekî zarxweş bû. Ji hal û rewşa Miço anîbû der û got: „Lo Miço, em niha gotinê zêde dirêj nekin. Hîn ku eyam germ e, tu were em herin xwe li avê xîn. Gava dema fitarê jî nêzik bû, em ê werin mal, xwarina xwe hazir kin û fitara xwe vekin. Dûra jî em ê ji xwe ra heta sora okeyê bilîzin!“

Miçê me di saya okeyê de nerm bûbû. Li Faro jî vegeyîya û got: “Ez ê pêşniyara te qebûl bikim. Lê şerteka min jî heye!“

Em ji hêlekê ve bi nermbûna Miço şa dibûn. Lê ji hêla din ve jî me şerta wî meraq dikir.

Faro bi zimanê xwe yê xweş got: “De qurbana canê te, te şert li me danîne me qebûl nekiriye. Em ê xwe qurbana şerta te bikin lo.”

Miço got: “Şerta min ew e ku gava me fitar vekir, em ê weke cimata nimêya terawiya bi hev ra bikin.”

Kêfa me gîştika hatibû şûnê. Me Miço ji ya wî kiribû û rê jî li me hatibû vekirin ku em herin xwe li avê xîn.

Min got: “Lo Miço, ew çi şor e? Ma canê te sax be lo. Ma tu tirsax te ya nimêya terawiya nebe. Ku em niha çûn me xwe li avê xist û em bi xwe de hatin, em ê ji te ra bi cimata bin jî, em ê nimê jî bikin. Him jî bi ezan û qamed. Bi ser da jî em ê te bikin îmâm ku ma sewabên te deh caran li yê me bin.”

Me karekî pir zehmet biribû serî. Me Miço ji ya wî kiribû. Loma ji şabûneke mezin di dev û ruyê me geriyabû. Tenê dol û zirne ji me kêmbû.

Me bi lez kinc û kolên xwe yê avê ber hev kirin. Em li bisikletên xwe siwar bûn û em ber bi cîhê xwe-liavêxistinê ketin rê.

Di salonê de em bi saetan di nav avê de man. Me tam ji avê derdixist. Di saya avê de me xwe ji germa li derva jî parastibû.

Li gor lihevkirina me diviyabû ku em vegerin mal û xwarina fitarê hazir bikin. Ji xwe zikê me jî êdî birçî bûbû.

Gava em hatin mal herkesî karek girte ser xwe. Yekî ji me meyîr, yekî goşt, yekî zad, yekî jî salate çêkir û me xwarina xwe hazir kir.

Tam di dema xwe de xwarina me li ser masê hazir bû. Em gî li ser masê civiyabûn. Bi vebûna fitarê ve me dest bi xwarinê kir. Ne di tabaxan û ne jî di biroşan de me tiştekek nehîştibû. Me binê tabax û biroşan wekî ku ji qitlixiyê filitîbûn rêş kiribû.

Me zikê xwe heta dêv têr kiribû. Ji ber xwarina pir û zêde giraniyekê dabû ser me. Her yekî me xwe li ser qoltixekê dirêj kiribû.

Piştî xwarinê Miço got: “Xortno piştî fitarê dema nimêya şîva ye. Ji

xwe we nimêya nivro û êvarê jî bi avê de bir.”

Me bi ro ya di dilê xwe kiribû. Me xwe li avê xistibû. Niha jî kesî ji me dil tunebû ku nimê bike.

Ji ber wê jî wekî ku me tiştekek nebihîstibe, tu deng ji me derneket. Li ser wê Miço banga xwe dúbare kir û got: “Xortno, de haydê zû kin, nimê li benda we ye.”

Min Miço nas dikir. Ku wî carekê bi ya xwe kir, karê me zor bû. Min di ber xwe da tê birîbû ku tenê xapînokek dikane me ji nimêya Miço xelas bike. Min berê xwe berve Miço kir û got: “Miço te avdest kir?”

Miço got: “Erê, erê. Min avdest kiriye.”

Min got: “Wê çaxê tu here dest pê bike, em avdest bikin em jî tên.”

Miço ji xapînoka min neanî der û çû cila xwe ya weke secade li xaniyê din rêxist û dest bi nimê kir.

Ku çing Miço dest bi nimê kir, min isqartayên okeyê derxistin.

Min got : “Hevalno, Miçoyê îşev serê me bi nimê û terawiya bêşîne. Tenê rêyek heye ku em xwe jê xelas kin, ew jî okey e.”

Ehmed û Faro jî ez erê kirim. Hîn ku Miço nimê teva nekiribû me bi sê kesan dest bi listina okeyê kir.

Gava Miço nimê teva kir û hate cem me, mês kir ku çî mês ke, em gî li ser okeyê rûniştine.

Miço got: “We nimêya xwe çi zû teva kir lo?”

Faro got: “Miço heyran dengê xwe meke lo. Tu nabînî elemanekî me kême. De were em li benda te ne ha.”

Miço vê carê pê li xapînoka me nekir û got: “Hûn dizanin, ji bo wextek nimê li dinya alî din çiqas ceza lê tê birîn? Hûn ê ji bo vê nimêya bi pênc deqîqeyan, tam 80 hezar sal di arê cehnemê de bişewitin. Dilê min bi we dişewite. Vê yekê rind bizanin!”

Min got: “Miço canê te sax be lo. Emê so ji bo vê nimêyê, qezakê bikin û xwe jê xelas kin. De were naziya meke lo.”

Miço got: “Na, na....ez vê gavê li ser okeyê rûnanim. Ji ber ku me hîn terawî nekiriye. We bi xwe soz dabû ku hûn ê weke cimat nimêya terawiya bikin.”

Li ser wê Ehmed jî got: “Em hîn jî li ser soza xwe ne. Kengî dema wê hat, em ê terawiya xwe jî bikin.”

Miço ji hêlekê ve canê xwe diçû ji bo okeyê, lê ji hêla din ve jî dizanîbû ku ew carekê li ser okeyê rûnişt, ji bo terawiya be jî ji ser ranedibû.

Loma jî li gor xwe qirareke rast da û got: “Ez niha dengê xwe nakim. Ez ê vekişim quncikê xwe û heta dema terawiyê tê, ji xwe ra tenekê ji quranê bixwînim. Ez ê wê çaxê bibînim ka

hûn li ser soza xwe dadiwestin yan jî na!”

Bi wî awayî dema terawiya hat û Miço jî ji şûna xwe rabû hat ba me û got: “Hevalno, dema bicîhanîna soza we hat. Ez dixwazim camêriya we bibînim.”

Ji Miço xelasî tunebû. Heta wê gavê me rind ber xwe dabû. Lê niha em ketibûn destê wî. Bêcare em ji ser okeyê rabûn û me haziriya nimêya terawiyê kir. Me avdesta xwe kir, cilên xwe raxistin, berê xwe ber bi qiblê kir û bi awayeke rûniştî ketin rêzê.

Di nava me da yê herî sunerm Ehmed bû. Miço jî ew dizanîbû û loma jî jê xwest ku ew ezanê bixwîne û qamedê bike.

Miço bi xwe jî bi awayeke serkeftî û ji xwe bi bawer telika xwe da ser serê xwe. Mîna îmamekî rast derbasî pêşiya me bû û li Ehmed îşaret kir ku ezanê bixwîne.

Ehmedê reben rabû ser pîya û dest bi xwendina ezanê kir: “*Ellahû ekber, ellahû ekber...*”

Ku çing Ehmed dest bi ezanê kir, kenekî bi Faroyê me girt. Faro li Ehmed mês dikir û dikeniya.

Min kuta Faro û got: “Lawo te serî xwariye, tu çi derziyê di Miço ra dikî. Bi Xudê carekê cina di Miço ra girtin, terawiya teva nake ha.

Lê belê ne xema Faroyê me bû.

Wî ji xwe ra lîstokek dibû û hîkehîk bû dikeniya.

Gava Ehmed ezan xwend û teva kir, Miço berê xwe ber bi Faro kir û got: “Em ê niha nimêya xwe bikin, lê ez naxwazim ji tu kesî dengê bibhîzim, tamam!”

Faro jî wekî ku bê erê serê xwe li ba kir. Miço rabû ser xwe berê da qiblê. Tevî wê em jî rabûn û me jî berê xwe da qiblê û li bendê bûn ku Miço dest bi nimê bike.

Miço destê xwe rakir, da bin guhê xwe, ullahûekbera xwe anî û destê xwe girê dan.

De tu were wê ku Miço çing go ullahû ekber, Faro dîsa kir hîkehîk.

Gava Miço ji bo çûyina rikûyê careke din got ullahûekber û xwar ve hat, Faro jî jê nema û careke din dest bi hîkehîka xwe kir.

Bi gotina Miço ya semîellahûlî-melhamide, Faro careke din keniya. Her ku Miço di nimê da tiştek digot Faro pê dikeniya. Bi rû da jî dikuta min û wekî ku bê li Miço mês ke, bi serê xwe îşmara Miço dikir.

Pişti demekê êdî min jî xwe negirt û ez jî tev li Faro bûm û em bihev ra dikeniyen. Her ku Miço digot ullahûekber, Faro û ez, em pê dikeniyen.

Ken û dengê me her ku diçû bilindtir dibû. Bi ullahûekbera Miço, kenê me jî pê ra hazir bû.

Di berdewamiya nimê da, êdî ne lazim bû Miço tiştekî bê. Em êdî bi xwe bi xwe bi hev dikeniyen. Wek nexweşiyek têgerok kenê me di Ehmed jî geriyabû û ew jî dikeniya.

Me êdî dev ji rêz û nimê berdabû û wek cimat em tenê dikeniyen.

Li ser wê, Miço bê ku silava xwe bidê nimê terikand. Berê xwe ber ve me kir, telika xwe ji serê xwe kir, ber ve me çeng kir û got: “Lo malneketino, va çi ye lo, eyb e yaw. Ser û binê wê me yê terawiyeye xwe bikira yaw. Çi hatiye dawestiyaye we hîkehîk e û hûn dikenin, hallahalla...”

Ez ne dibim îmam, ne nimê dikim, ne terawiya dikim û ne jî tiştekî din. Ez qet tu tiştî jî nakim...

Bi hêrs û terikandina Miço ya nimê, dengê kenê me tevahiya xanî dagirtibû. Em ji xwe derbas bûbûn. Bi qasî ku em keniyabûn, ji çavên me hêsir dihatin.

Miço jî tenekê bi awayekî matmayî li me mês kir û dûra got; “Lo Ehmed, de here çayekê bi ser de, masê jî hazir ke û qet neke em ji xwe ra okeyê bilîzin.”

Di saya kenê Faro da em ji terawiya Miço xelas bûbûn û di berdewamiya şevê de em heta sora bi okeyê lîstibûn.

Ödev

mexlim keta hundirî sinifê
û em ji ber rabûn
wexte ku wî got rûnin em rûniştin
min destê xwe rakir
demakê destê min li hewa ma bi şunda mêxlîm destê min ferq kir
– rabe ser xwe bibêjê ka tu yî ku çi bibejî
hundirê sinifê yî tarî herkî çû tarî bû
û xwezîya devî min zîya bû
– yengê got hevalekî xwe jî hilda were arîkariya min bikin
ez û hevalê xwe mem ji sinifê filitîn
em î yanzdeh salî bûn
bihar e
meha avrîlê ye
ax, roj û av ketibûn destî hevdu
axa ku di bin berfê da qercimî
bi ava berf û baranê ruberî xwe dikenî
û buxa ku ji axê avis hildihat
bîhna zindîtîyê li dor û alîyan belav dikir
av li didanên tebîetê dilîst
li her derê karê biharê
dem dema serhildanê ajdarana ye
çûçikên koçber qirş di navberê nikulan da
vedigerin hêlînên xwe
mêşên higiv û mozên zer
li navbera gulên darê di baxçî mektebê
jihevdiçûyî difirîn
li ser kanîyê malê şêxê keçên berzewac
kincên reng û bi reng li xwe kiribûn
û porên wanan dibiriqî
ez û mem çûn mala mexlim
mala mexlim di lojmanake ku bi ser xanîyê mektebê ve bû
me bi xanima mêxlîm re got

mustafa xoca em şandin ku alikarîya te bikin
– baş bû ku hûn hatin
ez û mem tenekê rehat bûnî
mêxlîm duh ödevên heftî çûyî konrtol kirin
û telebên ku bersivên xwe ye çewt bûn zirt engeftin
îro jî mexlîmik li ödevên ku serî hefte da dayî kontrol bike
ödeva ku em rapor bikin gelek zêde û bi zehmet bû
”bayrak, toprak, asker, vatan, millet, sakarya, gazi, mîsakî milli”
varlığım türk varlığına armağan olsun”
her peyvekê û gotinek ê deh caran di hundirî
hevokekê da were bikaranîn
ez î ji serpehatiyên xwe da dizanim
nivîsên dirêj şaştiyên xwe gelek dibûn
xeletî çiqas zêda bûn hejmare çokan jî li gor wê pir dibûn
min nivîsên xwe gelek qut dinivîsandin
an jî qet nedinivîsandin
û wê metodê jî qabilîyeta nivîsandinê û berhemkarîya min
kuh kir. kuşt. tirsand. bend ava kirin. ruh li serî min teng kir
cêrge û cêrge
fireh û azad fikirîn felc kir
û heftê rengên hundirî min reş kir.

Seyfi Doğan

Ji bo bîranîna Av. Faik Candan


Mem Xelikan

